HIKÛMETA FEDERAL

# NAMEYA PARASTINÊ

## HEMBER SUNETKIRINA ŞERIMGEHÎ A JINAN

Dema ku hûn diçin derveyê welat, hûn divê her tim vê nameyê li ba xwe hilgirin. Bi vî awayî hûn dikarin bi awayekî eşkere malbata xwe ji qedexe bûna sunetkirina şerimgehî a jinan di Elmanyayê û îhtîmala hevsa çend salan ji bo kesên ku vê yasayê îhlal dikin, agahdar bikin.

Hikûmeta Federal a Komara Federal a Elmanyayê

Federal Ministry
of Education, Family Affairs, Senior Citizens,
Women and Youth

Federal Ministry
of the Interior

Karin Prien
Federal Minister of Education, Family Affairs, Senior Citizens, Women and Youth

Alexander Dobrindt
Federal Minister of the Interior

Federal Foreign Office

Federal Ministry
of Justice and
Consumer Protection

Johann Wadephul
Federal Minister for Foreign Office

Dr. Stefanie Hubig
Federal Minister of Justice and protection

Federal Ministry
of Health

Nina Warken
Federal Minister of Health

**Sunetkirina jinan sûc e** û yek ji mînakên herî girîng a binpêkirin a mafên mirovane ku xisarên mezin ên fîzîkî û derûnî datîne ser keç û jinên ku tên sunet kirin. Pêvajoya sunet kirina jinan carnan dikare bibe sebeba mirina wan ji ber ku xwîn jê diçin an jî birînên wan enfekte dibin.

**Sunetkirina jinan di dewleta Alman de sûcekî tawanbare û dikare bibe sebeba zindanê bi dirêjahiya heya 15 salan ji bo kesên ku vê yekê encam didin.**

Sunetkirina jinan yanê rakirina hemî an beşek li endama zawzê a jinan; ku gelek caran endama cinsî a jinan berbi aliyê hundur ve tê dirûtin.

## Ev nameya çawa bi karê min tê?

Hûn dikarin vê nameyê bi xwe re bibin welatê xwe û wê nîşanî malbata xwe bidin. Di nameyê de hatîye gotin ku encam dana vê yekê li Elmanya yê **sûc e** –heke li derveyî welêt jî were kirin. Herwuha di nameyê de tê gotin ku kesên ku vî karî li ser keçên xwe encam didin an jî kesên ku dibin şahîdê vê yekê û pêşî lê nagirin û di prosedûrê de jî bibin alîkar sûcdarin ku divê ku heya **15 salan werin binçav kirin**. Encama vî karî dikare bibe Sebeb ku hikûmeta Elmanya nehêle hûn derbasî vî welatî bin an jî iqameta we a Elmanya ê were betal kirin.

# Sûcê tawanbar, (beşa 226an Koda Tawanbarî)

Gorî yasayên Elmanya sunetkirina jinan sûcekî tawanbare (beşa 226a Koda Tawanbarî). Her kesê ku vê yasayê îhlal bike, sûcekî tawanbar kiriye û divê li heya 15 salan were zîndanî kirin.

Sunetkirina jinan li **derveyî welêt** jî sûce Eger kesê ku jinan sunet dike elmanî be an keça ku ev yeka li ser tê encam dan elmanî bê divê ew kes were ceza kirin, Û herwuha encam dana vê yekê li ser kesa ku iqameta wê a Elmanyayê heye divê were ceza kirin.

Hemû kesên ku di pêvajoya sunetkirina jinan de hevkarîyê dikin sûcdarin.

Hemû kesên ku hewl didin sunetkirina jinan normal nîşan bidin sûcdar dibin.

Malbatên ku pêşiya sunet bûna keçên xwe çi li Elmanya çi li derveyê Elmanya nagirin jî sûcdarin.

Tu gunehên keç û jinên ku tên sunet kirin tune û ne divê werin sûcdar kirin.

Ew kesên ku keç û jinan sunet dikin, keçên xwe li hember sunet bûnê naparêzin û kesên din qayîl dikin ku keçên xwe sunet bikin, ê iqameta xwe ya Elmanyayê li dest bidin û nikarin derbasî vî welatî bibin.

## Sunetkirina jinan çî ye?

Sunet kirina jinan **binpêkirinek mezin a mafên mirovan** e ku tê de beşek an hemî li organa cinsî û klitoris a jinan tê birrîn û paşê jî ber bi hundur ve tê dirûtin, Hin caran organa wan piştî sunetê pir biçûk dibe. Di vê pêvajoyê de keç dibe ku gelek xwîn ji dest bidin an jî birînên wan enfekte bibin ku dibe sebebê **pirsgirêkên tenduristiyê** û hîn caran jî sebebê mirina wan.

- **Êşên her tum berdewam, birînên derûnî**
- **Pirsgirêkên welidînê, enfeksiyonên dirêjdem**
- **Nexweşîyên derûnî û êşên dema encam dana nêzîk bûna seksuel**

Jinên ku hatine sunet kirin ne tenê bi **astengîyên êş, nexweîyên derûnî û zar anî ê vê rû bi rû ne.** Gurçikên wan enfekte dibin, mîzdank a wan enfekte dibe û ev gelek caran jî xwîn ji bedena wan diçe bi êş.

Birînên jinan ên fîzîkî û derûnî bandoreke girîng datîne ser mafên wan di nêzîk bûên seksuel de. Nêzîk bûna seksuel ji wan re gelekî jandar dibin û gelek caran jî tu hisseke wan li warê seksuel de namîne ji ber ku wan tevineke esebî ji dest daye.

Çareyek ji bo zivirandina sunetkiriê **tune ye.**

# Çareyek ji bo zivirandina sunetkiriê tune ye? Eger ku ez guman bikim sunetê were encam dan, ez divê çi bikim?

Eger ku hûn bizanin ku hûn an jî kesên ku hûn nas dikin ji bo encama Sunetê FGM dibin derveyî Elmanya an jî di nav Elmanyayê de bi vê yekê re rû bi rûye hûn dikarin li van hejmaran bigerin

- **têlefona (polîs: 110) an**
- **buroya refahê ciwanan a herêmî.**

Xeta telefonê a alîkariyê hember şîdeta li ser jinan jî bi kar tê.

HILFE TELEFON
GEWALT GEGEN FRAUEN
08000 116 016

- Hejmara telefonê: 08000 116 016
- www.hilfetelefon.de

Xeta alîkariyê hemû roja û sietan, bi 18 zimanan, bi awayekî nenas û belaş xizmeta şîretkrîyê dide.

Eger ku hûn li derveyî welat in û pêdiviya wê bi alîkariyê heye, hûn dikarin bi nêzîktirîn mîsyona dîplomatîk a Almanyayê re bikevin têkiliyê.

Elmanî:
www.auswaertiges-amt.de/de/ReiseUndSicherheit/deutsche-auslandsvertretungen

Îngilîzî:
www.auswaertiges-amt.de/en/aussenpolitik/laenderinformationen

**Mohr kirin**

Ev nameya ji aliyê Hikûmeta Federal e û beşek li xebatên têkiliyên gelemperîye; ev belaş têtê peyda kirin û ne divê were firotin.

**li ser navê Dewleta Federal ve hatîye weşandin li aliyê:**
Bundesministerium für Bildung,
Familie, Senioren, Frauen und Jugend
Referat Öffentlichkeitsarbeit
11018 Berlin
www.bmbfsfj.bund.de

Ji bo girtina bersiva pirsyarên xwe,
bi rêya vê hejmarê li me bigerin: +49 30 20 179 130
Duşem – Pêncşem: 9 ê sibê - 6 ê piştî nîvro
Fax: +49 30 18 555-4400
Email: info@bmbfsfjservice.bund.de

Hejmara têlefona servîsên gelemperî ên hemû ajans û ofîsên hikûmetî: 115*

**Wek mînak:** Kanûna 2025an, çapa pêncemîn (kurmandschi)
**Dîzayn:** www.zweiband.de
**Prînter:** Kompaniyaya Çapa Dîcîtal a MKL û KG

* Ji bo bersivdana pirsîyarên giştî li hemû ofîs û ajansên hikûmetî, hejmara têlefona 115 ji berdeste Li herêmên beşdar, hejmara têlefona 115 ji siet 8 ê sibê heya 6 ê piştî nîvro di navbera Duşem heta Înê berdeste. Hemû peywendên telefonî, xetên malan û torên mobîlê bi hejmara 115 re li Almanyayê bi nirxê herêmî tên hesab kirin. ji ber vê yekê ji bo salmendan bêpere ne. Mirovên kerr ji bo berhevkirina agahîyan dikarin bi adresa SIP a 115@gebaerdentelefon.d115.de re bikevin têkiliyê. Ji bo ku hûn bizanibin servîsa 115 a li herêma ku hûn lê dijîn berdeste û herwiha berhevkirina agahîyan derbarê hejmara servîsên giştî, ji kerema xwe serekî li malpera http://www.d115.de bidin.